Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 388 nameronahi@gmail.com 03 - Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Di rojiyê de ava fêkiyan tîbûnê dişkîne



Di meha Remezanê de hin cûreyên ava mêwan ên taybet ku têne firotin hene. Ew cûre hêzê didin welatiyên bi rojî.
Welatiyên di meha Remezanê de rojî digirin, li bajarê Qamişlo jî wekî bajarên din ên Sûriyê cûreyên ava mêwan wekî "Ava sûsê, Temehindî, Celab, Qemerdîn û hwd" bikartînin. Ev cûreyên avê tîna welatiyên rojî girtine dişkîne û li ser fitarê gelekî tê bikaranîn.
Welatiyê bi navê Mihemed El-Sewas li Qamişlo di meha Remezanê de ava mêwan difiroşe. El Sewas diyar kir ku ew û zarokên xwe di meha Remezanê de ava mêwan difroş in û da zanîn ku her lîtrek temerhindî bi 300 lîreyên Sûriyê, her wiha celab û Qemerdîn bi 200 lîreyan difroş in. Ava mêwan ku di meha Remezanê de tê firotin faydeyên xwe li welatiyan di aliyê tenduristî de dike, ji ber ji mêwên xwezayî têne çêkirin...*ANHA*

# Lîstokgeha Reqayê ji nû ve hate vekirin



Bi nêzîkbûna cejna Remezanê re û bi armanca kêfxweşkirina zarokên Reqayê, xebatên ji nû ve vekirina lîstokgeha bajêr dest pê kir.
Çeteyên DAIŞ'ê beriya 4 salan kêfxweşiya zarok û şêniyên Reqayê bi talankirina lîstokgeha bajêr dizî bûn.
Lîstokgeha Reqayê di dema DAIŞ'ê de rastî dizî û talankirinê hatibû, lewra zarok ji lîstok, şadiyê û perwerdê bê par ma bûn. Armanca DAIŞ'ê ew bû ku zarokan tevlî xwe bikin di bin navê (Nêviyê El-Xîlafetê) de wan perwerde bikin.
Piştî rizgarkirina Reqa bi armanca geşkirina jiyana welatiyan şaredariya gel bi hevkariya Komîteya Hawirdor û Parkan re xebatên ji nû ve vekirina lîstokgeha bajêr destpêkirin.
Di derbarê vê mijarê de endezyar Mihemed xêr El-Erbeş wiha got: "Îro piştî rizgarkirina Reqayê, ji bo zarokan lîstokgeh tê vekirin. Armanca me bi vê yekê ew e ku lîstokgeh geş bibe û dilê zarokan xweş bibe...*ANHA*



# Li Gelîyê Feratê çandinî bi bereket e

Çandinî ji bo welatiyên Reqayê hêmana sereke ya jiyanê ye. Pirraniya welatiyên Reqayê debara xwe bi çandiniyê dikin. Ji ber ku dewleta Tirk herikîna ava çemê Feratê birrî ye, bandoreke neyînî li rewşa çandiniyê ya herêma geliyê Feratê bûye. Her wiha ji ber kêmbûna barana îsal ziyaneke neyînî bi hilberîna çandiniyê bûye.
Rewşa çandiniyê di van salên aloziya Sûriyê de gelekî paşve çûye, bi taybet gelek pompên avê û kanalên avdana zeviyan rawestiyan û vê yekê bandoreke neyînî li giştî jiyana cotkaran kir.
Li herêma Reqa di van salên borî de ji ber gelek sedeman rewşa çandiniyê gelekî paşve çûye. Yek ji van sedeman şerê li herêmê bû, bi taybet gelek kanalên avdana zeviyan hatin hilweşandin û komên çete gelek pompên derxistina avê dizîn.
Sedema din a sereke ya paşveçûna çandiniyê ew e ku hikûmeta Tirk herikîna ava





çemê Feratê li ser Sûriyê birrî ye û avê gelek kêm berdide.
Lê piştî ku bajarê Reqayê ji destên çeteyên DAIŞ'ê hate rizgarkirin, Komîteya Çandiniyê ya girêdayî Meclîsa Sivîl a Reqayê bi hemû hêz û derfetên xwe hewl dide rewşa çandiniyê ji nû ve vejîne. Komîteyê gelek pompên derxistina avê sererast kirin. Bi hatina demsala havînê re jî û demsala çinîna hilberînê komîteya Çandiniyê gelek alîkarî bi cotkaran re kir û niha hilberîna cotkaran dikirre.
Endamê Komîteya Çandiniyê ya Meclîsa Sivîl a Reqayê Îsa El-Hemadîn piştrast kir ku komîteya wan bi hemû hêz û derfetên xwe hewl dide rewşa çandiniyê li herêmê ji nû ve vejîne û di vê derbarê de hewl dide hemû pêdiviyên çandiniyê ji cotkaran re peyda bike.
El-Hemadîn destnîşan kir ku komîteya wan niha kîloya genim bi 175 lîreyan dikire.
Komîteyê her wiha tovê pembo ji cotkaran re peyda kir û hewl dide semad jî bi riya hin bazirganan peyda bike û buhaya wê jî diyar bike.
Di aliyê xwedîkirina sewalan de jî El-Hemadîn da zanîn ku Komîteya Çandiniyê hewl dide vî beşî jî pêş bixîne û dermanên pez û sewalan û êma wan peyda kirine.
Cotkara bi navê Zehra El-Mexrûd destnîşan kir ku hilberîna wan a genim ji ber lehiyên ji ber barana di van hefteyên dawî de ziyan dîtiye. Zehra bang li Meclîsa Sivîl a Reqayê kir ku alîkariya cotkaran bikin û rewşa çandiniyê li herêmê pêş bixînin...*ANHA*




Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 388 03 - Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

### Gerîla li Biradostê derbên giran li artêşa Tirk dide



*R-2*

# BIRYARA TUNEKIRINA KURDAN DANE



***Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Mûrat Karayilan, Pêngava 1'ê Hezîranê û hilbijartinên 24'ê Hezîranê yên li Tirkiyê nirxand. Karayilan got, "Dewleta Tirk biryar daye ku HDP'ê di bin benda hilbijartinê de bihêle lê wê ev yek bi hêsanî pêk neyê."***

## PLANÊN TUNEKIRINÊ KIRIN

Karayilan destpêkê li ser salvegera Pêngava 1'ê Hezîranê wiha got, "Tevgera Azadiyê ya Kurdistanê bi pêşniyar û fermana Rêber Ocalan roja 2'ê Tebaxa 1999'an şer sekinand û heta Hezîrana 2004'an yanî 5 salan ji bo avakirina bingeheke çareseriya siyasî, me fîşekek jî neteqand. Lê belê dewleta Tirk gav neavêt. Berevajî dewleta Tirk ket nava planên tasfiyekirina me. Piştî ku ev plana dewleta Tirk a dagirker kifş bû, biryara Pêngava 1'ê Hezîranê hate dayin."

## ŞERÊ ME ŞERÊ XWEPARASTINÊ YE

Mûrat Karayilan da xuyakirin ku ji ber polîtîkayên qirêj ên dewleta Tirk, ew neçar man xwe biparêzin û got, "Şerê ku em dikin şerê xweparastinê ye. Dewleta Tirk ji bo tasfiyekirina me, gelê me tevdigeriya. Bêguman em xwe bi rengê îdeolojîk, çandî û siyasî ve diparêzin. Lê belê li cihê ku ev bê bandor hatine xistin, em neçar in xwe bi rengekî çekdarî biparêzin. Eger çek nebûya, dibe ku weke gel û tevger em niha qediyabûna. Lewma mafê me yê herî xwezayî ye ku li dijî van êrîşên berfireh xwe bi rengekî çalak biparêzin."

## WÊ HER TIŞT LI GOR DILÊ WAN NEMEŞE


Karayilan diyar kir, Erdogan û dewleta Tirk paşeroja xwe bi tasfiyekirina gelê Kurd ve girêdane û wiha pê de çû: "Dibêjin, 'Eger Kurd bi ser bikevin, em ê têk biçin'. Destpêkê dixwazin Kurdan li Tirkiyê biqedînin, piştre jî li Iraq, Îran û Sûriyê Kurdan biqedînin. AKP'ê û dewleta Tirk biryar dane ku HDP'ê di binê bendê de bihêlin. Rejîma AKP'ê û hêzên dewletê ji bo serneketina HDP'ê hemû derfetên xwe bi kar tînin. Lê her tişt wê li gorî dilê wan nemeşe. Serketina di hilbijartinê de wê pêşî li destpêkirina pêvajoyeke nû ya demokratîk veke." *R-4*

## Bi Efrînê birîna me ji nûve vekirin



Sadiye Îbrahîm a 64 salî ya ji Amûdê ku bi xwe Ermeniyên ji Ûrfayê yê bakurê Kurdistanê ye û bavê wê ji Qirkirina 1915'an rizgar buye got, "Em di bin sîwana Rêveberiya Xweseriya Demokratîk de nasnameya xwe ya Ermenî bi rengekî azad dijîn. Tiştên ku li Efrînê kirin, birîna me ji nû ve vekirin. Ya ku wê wextê anîn serê me, niha tînin serê Efrîniyan." *R-3*

## Îrana demokratîk, Kurdistana Azad



Hevserokê KODAR'ê Fûad Bêrîtan diyar kir ku meyla civaka Îranê li ser demokratîkbûnê heye û diyar kir ku de serî de meseleya Kurd divê pirsgirêka hemû gelên din ên li Îranê li ser bingeha demokratîk bê çareserkirin. Bêrîtan wiha got, "Divê ji bo armanca Îrana demokratîk û Kurdistaneke xweser a demokratîk an jî federal, têkoşîn bê xurtkirin." *R-5*

## 25'ê Hezîranê de emê jiyaneke nû ava bikin


Hevserokê Giştî yê Partiya Demokratîk a Gelan HDP'ê Sezaî Temellî çû Amedê û serdana Meclîsa Dayîkên Aşitiyê kir. Temellî li wir axivî û wiha got, "Ji 24'ê Hezîranê re hindik ma, em ê biçin ser sendoqê û li aşitî, li vîna xwe xwedî derkevin. 25'ê Hezîranê em ê jiyanê bi hev re ava bikin." *R-5*

## 5 sivîlên din li Efrînê hatin kuştin




Zilm û hovîtiya artêşa Tirk û çeteyên wê li Efrînê gel bêzar kiriye. Hat ragihandin ku artêşa dagirker a Tirk û çeteyên wê li Efrînê 5 sivîlên ji eşîra Bobenê kuştin. Di nava kuştiyan de jinek û zaroka wê jî hene. Endamên eşîrê ji destpêkê ve ji êrîşên Tirkiyê û çeteyên wê nerazî ne. *R-2*

## Guhertina demografîk li Efrînê bi lez didome




Dewleta Tirk ya dagirker piştî ku Efrîn dagirkir, niha bi piştgiriya Rûsyayê bi awayekî lez demografya herêmê diguhere. Heta niha bi hezaran malbatên çeteyan ji herêmên weke Xuta û Dûma yên Sûriyê anîne li Efrînê bi cih kirine. Hat ragihandin du roj berê 40 malbatên çeteyan jî li gundê Kaxrê yê bi ser Mabata ve hatin bi cih kirin. *R-2*

## Rizgarkirina Minbicê gelek hevsengî guhert



Di 1'ê Hezîrana 2016'an de Meclîsa Leşkerî ya Minbicê û hin tabûrên din yên di bin sîwana QSD'ê de ne Pêngava Rizgarkirina Minbicê ji DAIŞ'ê dest pê kirin. Bi boneya salvegera destpêkirina pêngavê Endamê Fermandariya Meclîsa Leşkerî ya Minbicê Mihemed Ebû Adil diyar ku bi rizgarkirina Minbicê re gelek hevsengiyên leşkerî û siyasî li Sûriyê hatin guhertin.*R-4*

## DYA'yê derbarê QSD'ê de Esed hişyar kir




Serokê rêjîma Sûriyê Beşar Esed ji Televîzyona Russia Today re axivî bû û gef xwaribû ku dikare li dijî QSD'ê hêzê bi kar bîne. Li ser vê yekê Wezareta Parastinê ya Amerîkayê Pentagon'ê rêjîma Sûriyê hişyar kir û got, "êrîşeke li dijî Amerîka'yê an jî hêzên hevalbendên wan, wê bibe 'polîtîkayeke gelekî nebaş'." *R-4*


## QSD hêza hemû gelên Sûriyê ye



Berdevkê Fermî yê QSD'ê Kîno Gabrîel bersiv da daxuyaniyên Serokê Rêjîma Sûriyê Beşar Esed yên derbarê QSD'ê de ku gef xwaribû û gotubû dikare li dijî QSD'ê hêzê bi kar bîne. Gabrîel wiha got, "Di nava QSD'ê de xwîna hemû gelê Sûriyê ketiye nava hev. Ev peyamek ji hemû aliyan re ye. Rêjîm ji vê yekê acize lewma hewl dide tevlîheviyê di navbera pêkhateyan derbixe." *R-2*

## Bila hêzên Tirk ji Başûr werin derxistin





Parlementera YNK'ê Geşe Dara û parlementerê Goran Omer Înayet diyar kirin ku dewleta Tirk hewl dide başûr Kurdistanê dagir bike û dan zanîn ku divê hêzên Tirk ji başûr werin derxistin. Parlementeran got, "Armanca Tirkiyê ne şerê li dijî PKK'ê ye. Armanca wan dagirkirina başûrê Kurdistanê ye." *R-5*

## DYE rêxistina hevkarê Tirkiyê xiste lîsteya terorê

Wezareta Karên Derve yê Emerîkayê rêxistina çete ya bi navê Heyet Tehrîr El Şam ku navê wê yê din Cebhet El Nusra ye xiste lîsteya terorê. Rêxistina çete El Nûsra yek ji rêxistinên sereke ku li Sûriyê hevkarê dewleta Tirk e. El Nûsra hê jî bi piştgiriya Tirkiyê Îdlibê di bin dagirkeriya xwe de digire.*R-2*

# Guhertina demografîk li Efrînê bi lez didome

***Dewleta Tirk ya dagirker piştî ku Efrîn dagirkir, niha bi piştgiriya Rûsyayê bi awayekî lez demografya herêmê diguhere. Heta niha bi hezaran malbatên çeteyan ji herêmên weke Xuta û Dûma yên Sûriyê anîne li Efrînê bi cih kirine. Hat ragihandin du roj berê 40 malbatên çeteyan jî li gundê Kaxrê yê bi ser Mabata ve hatin bi cih kirin.***

Li Efrînê guhertina demografyayê ji aliyê dewleta dagirker de bi lez berdewam dike.
Artêşa Tirk a dagirker 40 malbatên din ên çeteyan li gundê Kaxrê yê navçeya Mabata ya Efrînê bi cih kirin.
Li gorî agahiyên ji çavkaniyên li Efrînê hatin wergirtin li gundê Kaxrê yê navçeya Mabata ya Efrînê artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê beriya du rojan 40 malbatên din yên çeteyên ji Xûta Rojhilat li gund bi cih kirin.
Hat ragihandin ew malbat di malên welatiyên Efrînê yên ji ber êrîşên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê dev ji malên xwe berdan, hatin bi cih kirin.
Li gor ku çavkaniyan diyar kirin çete li malên şêniyên gund ên bi navê (Mustefa Silêman, Qazqulî Silêman, Ehmed Cîrawa, Diyan Îmo, Mihemed Weqas, Fehîm Weqas, Henîf Izet Reşîd, Sadiq Izet Reşîd, Ciwan Sadiq Reşîd, Mihemed Mihemed Şêx Xelîl, Ferîd Hiso, Rişdî Hiso û Selah Îmo) û malên hinek welatiyên din bi cih kirine...*ANHA*



## 5 sivîlên din li Efrînê hatin kuştin



Hate ragihandin, 5 sivîlên ji eşîra Bobenê ku jin û zarokeke wê jî di nav de heye, hatine kuştin.
Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê şeva 31'ê Gulanê saet 02:00 li Efrînê 5 sivîlên ji eşîra Bobenê kuştin. Li gorî agahiyên ji herêmê hatin girtin, di nava kuştiyan de jinek û zaroka wê jî hene. Endamên eşîrê ji destpêkê ve ji êrîşên Tirkiye û çeteyên wê nerazî ne û ji ber vê yekê bajar neterikandin.

**3 SIVÎL HATIN REVANDIN**

Wekî din, li gor ajansa ANHA'yê li gundên Kefer Sefrê, Dêr Belût û Hecîlerê yên navçeya Cindirêsê, di serdegirtinên malan de 3 sivîlên bi navê Hisên Hec Ebdo, Ednan Hesen û Ebdullah Xelîl Mûrad hatine revandin.

## Serokwezîrê Spanyayê ji wezîfeyê hate girtin



Serokwezîrê mûxafazakar Mariano Rajoy ku şeş sal in li Spanyayê serkêşê hikumetê ye, ji aliyê parlamentê ve ji wezîfeyê hate girtin. Li şûna wî, Pedro Sanchez ê sosyalîst bû Serokwezîr.

Li ser pêşnûmeya pê baweriyê ya Serokwezîrê mûxafazakar dengdan hate kirin û ji 350 parlamenteran tenê 180 wekîlî baweriya xwe bi Serokwezîr anîn.
Rajoy beriya dengdanê daxuyaniyek da û diyar kiribû ku pêşnûmeya ji aliyê Partiya Sosyalîst PSOE ve hatiye pêşkêşkirin wê ji aliyê parlamentê ve bê qebûlkirin.
Rajoy got, "Mirov dikarin bêjin ku wê pêşnûme bê qebûlkirin. Pedro Sanchez wê bibe serokê nû yê hikumetê."
Pêşnûmeya pê baweriyê, beriya hefteyekê hatibû pêşkêşkirin. Rojek beriya dengdanê Partiya Gel a Rajoy di doza gendeliyê ya bi navê Gurtelê de mehkûm bû.
Ji vê Înê û pê ve wê Sanchez Serokwezîrê nû yê Spanyayê be. Bi vî rengî di dîroka siyasî ya Spanyayê de gaveke nû tê avêtin. Cara yekê ye ku di dîroka Spanyayê de Serokwezîrek bi vî rengî ji wezîfeyê tê girtin.
Pedro Sanchez piştî dengdanê daxuyaniyek da û got, "Em îro di dîroka demokrasiyê ya welatê xwe de rûpelekî nû vedikin."

## DYE rêxistina hevkarê Tirkiyê xiste lîsteya terorê



Wezareta Karê Derve ya Amerîka navê Heyet Tehrîr El-Şam (Cebhet El-Nusra) ku li Idlibê yek ji hevkarên sereke yên dewleta Tirke û hin navên din xistin lîsteyên rêxistinên teror.
Cebhet El-Nusra yek ji hevkarên sereke yên dewleta Tirk e. Herî zêde li Idlibê bi wê re di nava hevkariyê de ye. Pirraniya Idlibê di bin dagirkeriya wan de ye û li gorî itîfaqa di navbera Tirkiyê, Rûsya û Îranê ku li Astana pêk hat, herêma di bin dagirkeriya wan de girêdayî Tirkiyê ne.

## QSD hêza hemû gelên Sûriyê ye

Berdevkê Fermî yê QSD'ê Kîno Gabrîel diyar kir ku rêjîma Sûriyê naxwaze projeya demokratîk ya li Bakurê Sûriyê serbikeve û hewl dide ku di navbera pêkhateyên herêmê de tevlîheviyê derbixe û wiha got: "Bi vê yekê jî dixwaze desthildariya xwe li herêmê bidomîne."
Kîno Gabriel derbarê daxuyaniyên Serokê Rêjîma Sûriyê Beşar Esed ji ANHA'yê re axivî û da zanîn ku çareseriya leşkerî ji aloziya Sûriyê re ne pêkane û da zanîn ku şer wê hê zêdetir kuştin, derberî û koçberiyê li Sûriyê zêde bike û wiha dewam kir: "Rêjîma Sûriyê naxwaze projeya me serbikeve, lewma tevlîheviyê di nava pêkhateyên Sûriyê de derdixe. Armanca rêjîmê bi vê yekê ew e ku desthildariya xwe li ser gelê herêmê ferz bike."
Gabrîel da zanîn ku ew daxuyaniyên dijber qebûl nakin û got: "Em daxuyaniyên ku dijberiya QSD'ê dikin qebûl nakin. Em hêzeke Sûriyê ne. Vê rastiyê bi



parastina me ya hemû pêkhateyên Sûriyê de xwe nîşan daye.Hêzên me li gelek herêmên Sûriyê şer kir, gelek herêm rizgar kir. "
Berdevkê Fermî yê QSD'ê Kîno Girbraîl di dawiya axaftina xwe de diyar kir hêzên QSD'ê ji hemû pêkhateyên Sûriyê pêk tê û got: "Di nava QSD'ê de xwîna hemû gelê Sûriyê ketiye nava hev. Ev peyamek ji hemû aliyan re ye. Rêjîm ji vê yekê acize lewma hewl dide tevlîheviyê di navbera pêkhateyan derbixe."

## Li Biradostê derbên giran li dagirkeran hatin xistin



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir, li Başûrê Kurdistanê û Colemêrgê roja 31'ê Gulanê derbên giran li hêzên dagirker ên Tirk hatin xistin. Hate gotin, herî kêm 9 leşkerên Tirk hatine kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên vê dawiyê yên gerîla daxuyaniyeke nivîskî weşand û ev agahî da: "Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de roja 31'ê Gulanê li Colemêrgê û Başûrê Kurdistanê li dijî artêşa TC a dagirker çalakî kirin.
Li derdora geliyê Alî Dirêj ê li herêma Bradostê ya Sîdekan a Başûrê Kurdistanê, hêzên me yekîneyên veşartî yên dijin ên li ser hin giran digeriyan, şopandin. Piştî şopandina demeke dirêj, li girekî nêzî Geliyê Alî Dirêj, hêzên me saet 08:30'î lê dan. Ji du baskan ve ji cihekî nêz li yekîneya dijmin hate xistin û 5 leşkerên dijmin hatin kuştin.
Hêzên me saet 08:30'î li dijî dagirkerên li ser girê Lêlîkanê yê li herêma Bradostê çalakiyek kirin. Derbên xurt li çeperên dijmin hatin xistin û leşkerek hate kuştin.
Saet 12:30'î, hêzên me li dijî leşkerên dagirker ên li ser girê Bayrakê yê li herêma Barzanê ya Başûrê Kurdistanê çalakiyeke sûîqestê kirin. Di encamê de leşkerek hate kuştin.
Hêzên me saet 5'an li dijî girekî dijmin ê li nêzî gundê Bêzeno yê li navçeya Şemzînan a Colemêrgê çalakiyek kirin. Ji sê baskî ve derb li çeper û stargehên dijmin hatin xistin û di encamê de çeperek û 2 kon îmha bûn. Bi qasî ku hate tespîtkirin 2 leşkerên dijmin hatin kuştin."

## Du xwişkên hev dawî li jiyana xwe anîn

Du xwişkên hev ên 30 û 35 salî li bajarê Merîwan ê girêdayî Rojhilatê Kurdistanê xwe daliqandin, dawî li jiyana xwe anîn.
Li gor daxuyaniya berdevkê navenda tenduristiya bajarê Merîwan a Rojhilatê Kurdistanê, roja 31'ê Gulanê li Taxa Tepemusk a bajarê Merîwan, du xwişkên hev dawî li jiyana xwe anîn.
Herdû xwişkên ku ji bajarê Merîwan bûn, temenê wan 30 û 35 salî ne, bi ben xwe darvekirine û dawî li jiyana xwe anîn.
Her wiha hate diyarkirin ku cenazeyê herdû xwişkan hate rakirina morga nexweşxaneya Merîwan.
Hêjayî gotinê ye ku zext û tundiya rejîma Îranê ya li ser civakê û taybetî jinan û sînordarkirina mafên azadiyê, rêjeya xwekuştina jinan an jî kuştina jinan roj bi roj zêde dibe.





# Mihrîcana zarokan li Amedê didome

***1'emîn Mihrîcana Zarokan li Şanoya Bajêr a Amedê dest pê kir. Mihrîcana ku ji 2 beşan pêk tê beşa wê ya yekemîn bi dawî bû û beşa duyemîn dest pê dike. Namzeta Parlementeriyê ya HDP'ê ya Amedê Remziye Tosun tevlî vekirina mihrîcanê bû.***

Yekemîn Mihrîcana Zarokan a Amedê ku 27'ê gulanê bi pêşengiya Şanoya Bajêr a Amedê dest pê kir, berdewam e. Mihrîcana ku ji 2 beşan pêk tê beşa wê ya yekemîn bi dawî bû û beşa duyemîn dest pê dike.

Di beşa yekemîn de ji bo zarokan perwerdeya mîm, drama, kukla û hunerê hat dayîn û ji aliyê zarokan ve gelek berhem hatin afirandin. Di beşa duyemîn ku dê heta 3'ê hezîranê bidome de lîstîkên ku ji bo zarokan hatine amadekirin bê lîstin, ji aliyê Orkestraya Zaroka a Ma Musicê ku ji sed kesî pêk tê ve konser bê dayîn, li ser perwerdeya zarokan a mîm, drama û çêkirina kuklayan wê semînerek bê li dar xistin û berhemên zarokan ên ku di çarçoveya mihrîcanê de afirandine bên pêşandan.

Koordînatorê mihrîcanê Yavuz Akkûzû têkildarî mihrîcanê axivî û diyar kir ku mihrîcana ji aliyê zarokan ve rastî eleqeyeke mezin tê û wiha got: "Piraniya zarokan ji Komeleya Rengarenk û Weqfa Penaberiyê (Goc-Der) beşdarî mihrîcanê dibin. Ji xeynî zarokên van her du komeleyan gelek zarokên din jî beşdarî mihrîcanê dibin."





**ARMANCA MIHRÎCANÊ KURDÎ YE**

Akkûzû diyar kir ku ji bo rojên derbas bûyî yên mihrîcanê ji bo perwerdeya zarokan mamoste ji Stenbol û Îzmîrê anîne û ev tişt anî ziman: "Her wiha çend mamosteyên li Amedê jî piştgirî dane van mamosteyên ku ji Stenbol û Îzmîrê hatine. Heta niha mihrîcan baş derbas dibe û di çarçoveya mihrîcanê de ji aliyê zarokan ve gelek berhem hatine afirandin."

Akkûzû têkildarî armanca mihrîcanê jî got ku beriya ku Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê ji aliyê qeyyûm ve bê dagirkirin ji bo zarokan gelek xebatên bi kurdî hatine kirin, lê piştî qeyyûm hemû xebat niha li şaredariyê bi tirkî tên kirin. Akkûzû destnîşan kir ku ji bo bala zarokên Amedê bikişînin ser kurdî, mihrîcaneke bi vî rengî li dar dixin.

Namzeta Parlementeriyê ya HDP'ê ya Amedê Remziye Tosun û gelek zarok tevlî vekirina mihrîcanê bûn. Di merasîma vekirina mîhrîcanê de Remziye Tosun axaftin kir.

Remziye, di serî de Mihrîcana Zarokan li hemû zarokan pîroz kir û got ku zarok di şert û mercên gelek xirab re derbas dibin û xwest ku ji bo zarokan tim bernameyên cuda bên çêkirin û wiha berdewam kir: "Li gelek deveran û li Kurdistanê ji ber şerê heyê mafên zarokan tê binpêkirin. Bi taybetî jî zarokên ku îro hatin tevli vê mîhrîcanê dibin zarokên di bin bandora şer de gelek mane ne. Ez jî dayik im û dizanim ku şer çiqas bandora neyînî li zarokan dike. Ji ber şerê ku qewimî derûniya zarokan gelek xirab bûye û îro hîn jî ev şer ji ber ku li Sûrê xanî tên weşandin bandora xwe berdewam dike. Îro pêdiviya zarokan bi çand, wêje û hûnere heye. Ev xebatên ji bo zarokan tên kirin wan gelek kêfxweş dikin. Kêfxweşiya zarokan kêfxweşiya me ye ji ber ku zarok pêşeroj û hebûna me ne."

## Dêra Suryaniyan kirine fakulteya Îlahiyatê



Rêjîma AKP'ê li ser hemû gel, ol û bawariyan kirinên dij mirovî dike. Bi vê yekê, dixwaze çandên resen û cihên dîrokî ji rastiya wê derxe.

Dêra Azîz Petrûs Azîz Paûlûs a Suryaniyan weke Navenda Çandê ya Şaredariya Eyyubiyeyê û Weqfa Fakulteya Îlahiyatê ya Zanîngeha Herranê tê bikaranîn.

Dêra Azîz Petrûs Azîz Paûlûs (Rejî) a li meydana Ellî Sekîz a li Rihayê ye, sala 1861'ê ji aliyê gelê Suryanî Yakûbî ve li ser bermahiyên dêreke ji sedsala 6'an mayî hate çêkirin.

Dêr ji bo bîranîna du hawariyên hezretî Îsa; Azîz Petrûs û Azîz Paûlûs hate çêkirin û navê wan lê hate kirin. Heta sala 1924'an ji aliyê Suryaniyên li Rihayê ve weke dibistanê dihate bikarnîn. Sala 1925'an Suryaniyên dawî yên li Rihayê ji wir hatin sirgûnkirin. Hinekan berê xwe dan Ewropayê, hinek jî çûn bajarê Helebê yê Sûriyeyê. Bi vî rengî Dêra Azîz Petrûs û Azîz Paûlûs bêxwedî man.

Dêr, sala 1924'an radestî îdareya Kargeha Tûtin, Xwê û Alkolê (TEKEL) hate kirin. Ji hingî ve navê 'Dêra Regie (rejî)' lê hatiye kirin ku peyva rejî bi zimanê Fransî ye û tê wateya TEKEL. Kêlên ji dêrê hatin derxistin jî şandin Muzeya Rihayê.

Walîtiya Tirk a li Rihayê sala 1998'an ev de restore kir. Sala 2002'an bi protokolekê re dêr radestî Şaredariya Eyyubiyeyê hate kirin û navê "Navenda Çandê ya Walî Kemalettîn Gazezoglû" lê hate kirin. Dêra ku li Rihayê yekane îbadetxaneya Suryaniyan e, piştî ku hate restorekirin weke Navenda Çandê ya Şaredariya Eyyubiyeyê û Weqfa Fakulteya Îlahiyatê ya Zanîngeha Herranê hate bikaranîn.

Tûrîstên tên Rihayê dixwazin bi taybetî serdana Dêra Azîz Petrûs û Azîz Paûlûs bikin, lê belê pêşiya dêrê weke parka wesayitan tê bikaranîn û li hewşa wê jî ehleyên Quranê hene



## Çend Lîstokên Kurdan

Sîpan ŞÎNDA

Hemî netew, civak, qewm, qebîle xwediyê çandên cuda ne. Lîstok ji hîmek, stûnek yê çandê ê stûr û giranbihaye. Mirov ji zarokî heya dawiya jiyana xwe pêdiwiyê bi lîstin û lîstokan dibîne. Ya rast lîstok û lîstin qetek ji jiyana kesan, civakane. Mirov çi bi plan, çi bê plan her tim dixwaze bilîzin. Û dilîzin! Ji ber ku pêdiwiye. Ji bûna derûniya mirovan lîstok weke dermanekêye. Dema mirov dikeve di nava lîstokê de xwe ji bîrve dike, ji êş û elem, kul û derd, xem û xiyalan dûrdikeve. Wê heynê tenê lîstin û lîstok ji bo wan girînge. Lîstok di wê demê de dibe hîma jiyana lîstikvanan ya herî girîng. Armanc her çend di lîstokê de serkevtin be ji, bes tişta ji bo lîstikvanan girîng û wan dorpêç dike lîstine û ew sehte. Emê niha behsa çend lîstokên Kurdan bikin.


1) Guhşegî

Guhşegî yek ji lîstokên Kurdan ya herî kevin û zêde tê lîstine. Her çend niha neyê lîstin ji bes ew di nava Kurdan de lîstokkeka bilave. Di vê lîstokê de: 1) Du bir hene. 2) Du Kûndel hene. 3) Guhik (gok) heye. 4) Darê mirov pê li guhikê bide heye. Ji beriya lîstok destpê bike lîstikvan di nava xwe de du biran çêdikin. Paşê bi riya ter û şil yan bi riyeke din, pêşiyê wê kî li gokê bide diyar dikin. Piştî ev diyar kirin lîstikvanên li gokê bidin li ber kûndelê li benda dûra xwe disekinin ku ew li gokê bidin. Bira din jî yek dimîne li ber kûndelê û ji bira pêjber re regokê dihilavêje, yên din ji bilav dibin da ku gokê bigirin û ji lîstikvanên bira li gokê didin bidine. Dema bira li gokê bidin divê li ser kûndela yekem nekevin. Dema hevalêkê wan li gokê dide hege ew bir bikare hemî yan ji kî zîrek be dibezin ku xwe bigihînin kûndela didûwê. Hege guhik dûr çûbe ew dikarin ji kûndela yekem biçin kûndela duyem û dîsa bên kûndela yekem. Hege negihên biçin û bên dikarin li ser kûndela duyem bisekinin heya hevalek din yê wan li gokê dayî. Di vê navberê de hege dema gok qiloz (bilind) dibe ji wê birê yek gokê hêj neketî erdê li hewa bigire, ew bir hemî ji nûve dikarin bên li ser kûndela yekem û li gokê bidin. Di vê navberê de dema bira gokê dihilavêje gokê bigire û wê li lîstikvaneke bira li gokê dide bide, ew bir dişewite û vê carê dibe dûra wan ew li gokê didin. Heman rîtûel dîsa tên dubare kirin. Bes kelecanek û zewqek cuda di vê lîstokê de heye. Yên bixwazin derkevin ji derveyî rêgezên lîstokê çêdibin. Qîr û heydedan. Ji xwe dema yek gokê li hewa digire hewa û forsek welê tavêje hevalên xwe bira pêjber nayê gotin.

2) Heblo

Heblo ji lîstikeke bi du biran tê lîstine. Ev lîstok bi şev tê lîstin. Divê ev lîstok ji derve bê lîstin. Di vê lîstokê de ji Kûndel heye. Kevirekî di nava agirî de germ dikin û bi wî kevirî dilîzin. Herdû bir ji li ser kûndelê disekinin û berê xwe didin kûndelê. Yek wî kevirê germ paş xwe ve tavêje û paşê ji herdû bir li wî kevirî digerin. Kî kevirî bibîne bi dengê bilind dibêje Heblo! Paşê ji kar dike ku wî kevirê germ bîne li kûndelê bide. Lîstikvanên bira din ji hewl didin ku wî kevirê germ ji lîstikvanên bira pêjber bistînin û bînin li kûndelê bidin. şertê vê lîstokê divê lîstikvan wî kevirê germ li kûndelê bidin.

RAMANÊ RÊBERTIYÊ



## Neteweya Demokratîk -5-

Abdulah Ocalan

Ya rastî, dikare gelek netewetiyên cuda bikevin nava hev. Eger neteweya demokratîk bi neteweya huqûqî re li hev bike, bi hêsanî dikarin bi hev re bijîn. Tevî ku welat, al û ziman hêja ne jî ne pîroz in. Welat, ziman û alên hevpar dikarin di nav hev de, li şûna dijberiyê li ser bingehê dostaniyê bi hev re bin, ev hem pêkan e, hem jî li gorî jiyana civaka dîrokî ye. Diyardeya neteweya demokratîk bi van xisletên xwe hemûyan weke alternatîfa bi hêz a dewletdariya neteweyê ya destikê harkirina şer weke modernîteya demokratîk di dîrokê de ji nû ve cihê xwe digire. Modela neteweya demokratîk weke modeleke çareserker, têkiliyên civakî yên neteweperestiya dewletê parçeparçe kirine ji nû ve demokratîze dike, li hev tîne, aştiyane û bêhnfireh dike. Kengî dewleta netewe ber bi neteweya demokratîk biberide ev yek ê bi xwe re destketiyên gelekî mezin bîne. Modela neteweya demokratîk beriya her tiştî têgihiştinên civakî yên bi şîddetê barkirî bi serwextbûneke rast a civakî nerm, mirovane û milahîm dike ango mirovî biaqil û hestyar dike, wî dike mirovê xwedî empatî û xweşbîn. Bêguman têkiliyên mêtinkariyê yên şîddet dawerivîne navê bi tevahî ji holê raneke jî dikare têra xwe kêm bike, bi pêkanîna derfet û îmkanên ji bo civakeke azadtir û wekhevtir vê bi cih tîne. Bi tenê ji bo nava xwe xweşbînî û aştiyê pêk nayîne, di heman demê de li dijî neteweyên din ên li derve nêzîkatiyên bi zordestî û mêtinkariyê barkirî vediguherîne berjewendiyên hevpar û sînerjiyê, û bi vî awayî vê mîsyona xwe pêk tîne. Kengî saziyên neteweyî û navneteweyî li gorî têgihiştina bingehîn a sazîbûn û zêhniyeta neteweya demokratîk ji nû ve hatin avakirin, wê baş were fêhmkirin ku modernîteyeke nû ango modernîteya demokratîk, ne bi teorîk bi encamên pêkanînê jî bi qasî Ronesansekê ye. Alternatîfa modernîteya kapîtalîst moderniteya demokratîk û neteweya demokratîk a di bingehê wê de ye; civaka ekonomîk, ekolojîk û aştiyane ya di hundir û derveyî neteweya demokratîk de deribandî ye.

Di roja me ya îro de li şûna dewleta netewe bi xwe ya nava wê vala yan jî hatiye valakirin, yekîtiyên wê yên herêmî û global û nexasim jî Neteweyên Yekbûyî, divê neteweyên demokratîk ên nû yên bi performansa bilind a xisletên xwe yên pirsgirêkan çareser dikin bêne avakirin. Divê ev yek bi tenê weke neteweya demokratîk a şûna dewleta netewe ya taybet bigire û wê veguherîne neyê dîtin. Ji bo rizgarbûna ji krîza kapîtala fînansê, ev rêya herî rast a polîtîk û exlaqî ye ku modelên herêmî û global di nava hev de pêşde dibe. Serê têgihiştina nasnameya neteweyî vekiriye; mîna mumîntî û endametiyeke dîn a sergirtî nîne. Mirov ji neteweyekî be, ev ne cihêwazî ye, ne jî qusûr û kêmaniyek e. Mirov dikare ji yekê zêdetir bibe endamê neteweyan.

# Komîn civak û gelan dike yek

**Li Rojava û bakurê Sûriyê xebatên avakirina komînan û li dora van komînan jî xebatên rêxistinkirina civakê dewam dike. Komînên li Bakurê Sûriyê li gor cografiya taxan tên avakirin. Her 100-150 mal xwe didin hev û komînekî ava dikin. Li taxa Kornîş ya Qamişlo Kurd, Ereb û Suryanan bi hevre 58 komîn ava kirine. Rêveberê TEV-DEM'ê taxa Kornîş Ednan Silêman anî ziman ku hemû pêkhate cihê de di komînan de digirin.**

Yekem civakbûyîn li Rojhilata Navîn hate avakirin, bi demê re sîsteman desthilatdarî meşandin. Piştî serdema Neolotîk, civak bi desthilatdariya sîstema baviksalarî hat rêvebirin. Piştî parçekirina ol a ji aliyê xelîfe û mezheban ve civak di aliyê baweriyê de hat parçe kirin. Demek dirêj civaka ku ji ber parçekirinên olî û mezhebî bedel da. Vê carê jî bi desthilatdariya feodalîzmê û netewperestiyê civak hat parçekirin.

Şoreşa Rojava gelek guhertin di nava civakan de avakir. Bi riya avakirina bingeha civakbûyînê komînan jiyana hevbeş û demokarsî di nav civakê de belav kir.

### ŞOREŞA ROJAVA BÛ BINGEHA RASTIYA CIVAKÊ

Piştî Şoreşa Rojava cara yekem bingehê sîstemek ku hemû gel û bawerî xwe di nav de dîtin hat avakirin. ji beriya 7 salan ev bingeh hatî avêtin. Civaka ku bi sedan sale tê parçekirin bi Şoreşa Rojava re li dora sîstemek demokratîk dicivin. Ev sîstema demokratîk a ku em qalê dikin ji avakirina komînan destpê dike. Civaka ku hertim bi gotina kesek yan jî fermanên jor jiyan dikirin, niha ji nava taxa xwe bi biryarên xwe dijî. Lewma komînan avadike, pêwîstî, şert û mercên jiyana xwe pêktîne.



Ji bo sîstema demokratîk baş bê fêm kirin divê bizanin komîn û rêgezên wê çine. Komînên li Bakurê Sûriyê li gor cografiya taxan tên avakirin. Her 100-150 mal xwe didin hev û komînekî ava dikin. Li gorî şertên tax û komînê jî komîte û rêxistina xwe avadike.

Yek ji van taxan jî Taxa Kornîş a Qamişlo ye. Taxa Kornîş ji 58 komînan pêk tê. Ji van 58 komînan 3 ên Suryan û Ermen, 3 yên Ereb û yên din jî yên Kurd û Ereb bi hev re ne.

### FERQ DI NAVA GELAN DE TUNE

Yek ji komînên pêkhateyên Kurd û Ereb Komîna Ş. Berxwedan Betal e. Hevserokên vê komînê Kurd û Ereb in. Hevseroka Komînê Salîhe Xidir Îbrahîm ku, diyar kir ku di komînê de ti ferq di navbera gelan de tine û wiha got; "Ji ber ku em hemû pêkhateyên vî welatî ne. Beriya ku komîn werin avakirin tu xizmet di nava taxan de nedihat kirin, piştî komînan pêdivî, xizmet û rêxistina gel di nava taxan de pêkhat."

Salîhe bal kişand ser rewşa jinan û da zanîn ku jinên ereb bi rêxistina civakî re hêdî hêdî ji qalibên edet û qalibên teng ên civakî derketin. Salîhe destnîşan kir, jina ku tenê erkê wê kiribûn xwarinçêkirin, niha rolê xwe di komînan de digire û nêrînên şaş ên di derheqê jinê de ji holê radike.

### ME LI VIR DESTÊ XWE DA HEV

Hevseroka Komîna Ermen û Suryan a Ş. Athro (Sohdo H. Athro) Viyolet Hena ya suriyanî da zanîn ku di nava komînê de hevkarî heye û ev wan gelek keyfxwşe dike. Hevserokê Komînê yê Ermen Hemazasap Krpko Reban destnîşan kir ku ew jî ji bo pêkhateyên Kurd, Ereb, Suryan û Ermenî dest bidin hev û bi hev re jiyan bikin di komînê de cih digre. Reban diyar kir ku ew di komînê de yekin û wiha pêde çû; "Em bi hev re dijîn, ciwanên me bi hev re welat diparêzin. Eger ev sîstem berdewam bike pir başe, ji bo vê jî divê em xwedî lê derbikevin."



### CIHÊ ÎRADEYA GEL E

Hevserokê Komîna Komîna Ş. Fexrî, Hisên Berzencî da zanîn ku gelê me bi hezarên salane di bin hişmendiya kesekî û dewletê de hatiye rêvebirin û wiha axivî; "Hîn gelê me baş fêrî jiyana komînal nebûye. Ji bo fêrbûnê jî perwerde pêwîste. Bi salane wisa fêr bûye, hîn jî kesên din berpirsyar digire. Lê di rastiyê de komîn cihê îrade û biryarên gel e. Gel divê bizane komîn a her kesê di nava taxê de ye, herkes dikare fikrê xwe têde bîne ziman û biryarên taxa xwe bi xwe bide."

### RÊXISTINA CIVAKÎ AVAKIR

Rêveberê TEV-DEM'ê taxa Kornîş (Meclîs) Ednan Silêman jî da zanîn ku taxa Kornîş wek tabloyek mozaîke, ji her pêkhateyî tê de cih digire û xweşiya vê taxê jî bi mozaikbûna wê ye. Silêman diyar kir ku beriya sîstema demokratîk, dewletê ferq dixist nava gel, heta gelê kurd bê nasname bû û gotinên xwe wiha berdewam kir; "Bi avakirina komînan re rêxistinek civakî hat avakirin. Her kesî bi awayek wekhev di rêxistinê de cih girt."

## Perwerde civakê pêşdixe



Melek DEMÎRTAŞ


ji bo pêşketina civakê hêmana serke perwerde ye. kesayetên civakê ji dema zayînê de heya bi mirinê gelek perwerdeya distîne. Li mal, dibistan û her wiha saziyê lê kar dike.

Li Rojava jî, ne tenê li dibistanan; lê gelek sazî jî rola xwe di perwerdekirina civakê de dilîzin. Yek ji wan saziyan Wqfa Jina Azad e. ji dema vekirina vê saziyê heya niha gelek cureyên perwerdê vekirine. Rêvebira Weqfa Jina Azad a Rojava ya Beşê Perwerdê Hena Elî derbarê perwerdeyên wan de ji Ronahî re axivî.

### GELEK DEWRE HATİN VEKİRİN

Li Weqfa Jina Azad Perwerde wiha ne, beşê Bexçê Zarokan, werzîş û zimanê kurdî û ingilîzî, tendrustî, derûnî, dirûtin û kompiyuter. Weqfê 10 bexçên zarokan avakiriye û 41 mamoste hene."

Perwerdeyên mûzîkê li Navenda weqfê û Enteriyê ji 60 zarokan re tê dayîn, taybet di dema dawîkirina demsla xwendinê de.



Di heman demê de jî perwerdeyên ziman jî di vê salê de 4 grup ji 70 jinan bi dawî kirin û hîn mîna van perwerdeyan piştî meha rojiyê wê berdewam bikin."

Perwerdeyên Tendrustî ji aliyê komîyeta Meclisa Tendrustî tên birêvebirin hemû cureyên beşê tendrustî û semînerên derûnî li weqfê tê dayîn. Her wiha 3 navendên tendrustî li Dêrik, Qamişlo û Serê Kaniyê hene. Ji bo werzîşê jî du grub hene yek danê sibê û ya din êvarê tê dayîn. Çarçoveya dayîna perwedê bi giştî sê mehin, dema ku perwerde bi dawî dibe jinên ku daxwaziya wan kar hebe li gorî derfetên xwe û perwerdeya ku wê dîtî di saziyên xwe bi cih dikin. Hêjayî gotinê ye ku Weqf heman perwedeyan di hundirê kampa Roj û Holê de jî didin.

## Werzîşa jin li Mınbicê jî pêşdikeve

Ferîşte NEZÎR

Pêşketina civakê bi beşdarbûna jinê ya hemû aliyê jiyanê pêk tê. Yekîtiya Werzîşê ya Bajarê Minbicê û Gundewarên wê ya girêdayî Komîteya Werzîş û Ciwanan, di 17`ê Mijdara 2017'an de, di çarçoveya Kongreya Damezrêner a Yekîtiya Werzîşê ya Minbicê de, Komîteya Werzîşê ya Jinan a Minbicê hatibû avakirin.

Li bajarekî wek Minbicê ku ni hatiye rizgarkirin, hemû aliyên civakê û bi taybet jin xwe ji hemû aliyan de pêşdixin. Avakirian komîteya werzîşê ya jinan yek ji van pêşketinan ne. di encamê de tîmên jin ên wekî Volêbol û basket bolê li Minbicê hatin avakirin.

### KEVNEŞOPİYA PAŞVERÛ BİŞKÎNE

Ji ber adet û kevneşopiyên paşverû, jin di malê de hatibû sînordar û qeydkirin, rê nedihat dayîn ku jin rola xwe di civakê de nîşan bide. Di demên derbasbûyî de, navendek ango hola estetîka bedenî taybet bi jinê li Minbicê vebû, lê dîsa jin tenê di asta navendekê de hiştbûn. Lê ev gava avakirina tîmên jin wê vê hişmendî û



kevneşopiyê bişkîne û çanda werzîşa jinan li civaka Minbicê belav bibe.

### BİNGEHA Jİ HEMÛ JİNAN RE

Ev gav di encama serdana Yekîtiya Werzîşê ya Minbicê û Komîteya Werzîşê ya jinê ji Herêma Cizîrê û Kobanê re hate avêtin. JI ber ku hat xwyakirin jinên Rojava di qadê werzîşê de xwe pêşxistiye, her wiha di hundirê dibistanên Minibcê de maratona bazadnê çêbûbû ku jin jî cihê xwe tê de girti bû, ev jî bû bingeh ku gavek wiha bê avêtin ku Komîteya Werzîşê ya Jinan a Minbicê tîmanên Volêbol û Baskêt bol a jinan avakirin. Hijmarek baş ji jinên Minbicê beşdarî van tîman bûn, her wiha wê di demên pêşde hazirtiyên tîmên temnên cuda jî bikin, ev gav wê rê ber daqadê din ên werzîşê veke.



# Bi Efrînê birîna me ji nûve vekirin

**Sadiye Îbrahîm a 64 salî ya ji Amûdê ku bi xwe Ermeniyên ji Ûrfayê yê bakurê Kurdistanê ye û bavê wê ji Qirkirina 1915'an rizgar buye got, "Em di bin sîwana Rêveberiya Xweseriya Demokratîk de nasnameya xwe ya Ermenî bi rengekî azad dijîn. Tiştên ku li Efrînê kirin, birîna me ji nû ve vekirin. Ya ku wê wextê anîn serê me, niha tînin serê Efrîniyan."**

Malbata Sadiye Îbrahîm yek ji Ermeniyên ji Rihayê ye ku ji qirkirina 1915'an rizgar bûye. Sadiye dibêje, "Ya ku wê wextê anîn serê me, niha tînin serê Efrîniyan."

Sadiye Îbrahîm a 64 salî ya ji Amûdê got, "tevî ku 103 sal di ser re derbas bûne jî êşên wan hê nû ye û diyar kir, bi zext û zilma li Efrîniyan tên kirin re êşa wan girantir bûye.

Bavê Sadiye Îbrahîm yek ji Ermeniyên ji Rihayê ye ku ji Qirkirina 1915'an rizgar bûye. Dayika wê jî Kurd e. Sadiye Îbrahîm li Amûdê ji dayik bû û nih ali Qamişloyê dijî. Xwe bi nasnameya xwe ya Ermenî dide naskirin. Bi gotina "Zarokên min, eslê xwe ti carî ji bîr nekin" a bavê xwe mezin bûye. Êşa ku bavê wê, gelê wê kişand, niha ew bi xwe jî dijî. Sadiye Îbrahîm dibêje, "Mîna sala 1915'an îro jî li Efrînê mirov ji cih û warê xwe tên dexistin, tên kuştin, jin û zarok tên revandin."

Dayika Sadiye bi bîr dixîne ku ji malbata wê tenê bav û metka wê ji Qirkirina Ermeniyan rizgar bûne û wiha dewam kir: "Heta ku ez diçûm pola 6'an min bavê xwe timî bi rengekî xemgîn didît. Min rojeke wî ya xweş nedît. Ji bo malbata xwe bibîne li her derê dipirsî. Em 6 xwişk û bira bûn. Ji me re timî qala van çîrokan dikir. Digot, 'Zarokên min, hûn eslê xwe ji bîr nekin. Belê îro hûn Misilman in, lê belê hûn Ermenî û Xiristiyan in'. Ji ber ku malbata ew girt jî timî veşartibû ku ew Ermenî ne. Xwe weke Misilman nîşan dabûn. Ji ber ku Tirkan li ku derê Ermen dîtibûna yekser ew dikuştin."

### BI EFRÎNÊ RE BIRÎNA ME JI NÛ VE VEKIRIN

Em îro di bin sîwana Rêveberiya Xweseriya Demokratîk de nasnameya xwe ya Ermenî bi rengekî azad îfade dikin û dijîn. Ya ku anîn serê me niha jî tînin serê Efrîniyan. Tiştên ku li Efrînê kirin, birîna me ji nû ve vekirin. Kes li ber ranebû. Dibe ku em her tiştî nabihîzin, lê belê zilmeke giran li gelê Efrînê dikin. Wan ji cih û warê wan derdixînin û li pêş çavên wan hinekî din tînin li malên wan bi cih dikin. Çawa ku Ermenî ji cih û warê wan derxistin, hinekî din li şûna wan bi cih kirin û navê wê derê guhertin, niha jî li Efrînê heman tiştî dikin."…*ANF*



## Sûka Papûle berhemek aboriya jinan e

Ronahî EHMED

Sûka jinan ya bi navê Papûle yek ji berhemên jinan e û bala hemû jinan dikişîne. Rojane jin berê xwe didin sûka Pepûle û li wir danûstandinê dikin.

Li bajarê Dêrikê sûka jinan ya bi navê Papûle di 23'yê meha Nîsanê 2018 an de ji aliyê Komîteya Aboriya Jin ya girêdayî Kogreya Star hat vekirin da ku jin bi hêsanî danûstandinê bikin .

Ji rêveberên sûka Pepûle Nejma Silêman li ser armanca vekirina sûkê axivî û diyar kir ku beriya sûk were vekirin wan di nava şert û mercên zehmet de jêre amadekarî kirine. Necma wiha got, "Ev sûk girêdayî Komîteya Aborî ya Jin ya Kongreya Star e. Di sûka Papûle de 21 dikan hene. Di vê sûkê de malbatên ku rewşa wan ya aborî nebaş e û ji bo ku debara xwe bikin lê dixebitin. Jin bi kêfxweşiyeke mezin li sûka Papûle de dixebitin."

Rêvebara sûka Papûle Necma Silêman di dawiyê de wiha got, "Daxwaziya me ew e ku jin bi hêsanî werin sûka Papûle danûstandina xwe bikin."









Jina bi navê Xîtam Heso ya ku di sûka Papûle de dixebite nêrîna xwe li ser sûkê anî ziman û diyar kir ku ew bi moralekî bilind karê xwe yê sûkê dike û wiha axivî, "Ez di destpêkê de cihê xwe di xebatên sûkê de digirim. Destpêkê me bi heşt dikanan dest bi xebatê kir. Lê niha hêjmar li sûkê buye 21 dikan."

Xîtam Heso di dawiyê de da zanîn ku têkiliya wan bi bazirganan re gelek baş e û got, "em hewl didin ku ti pirsgirêk dernekevin."

Jina Ereb ya bi navê Îsra Ehmed jî derbarê sûkê de kêfxweşiya xwe anî ziman û wiha got, "Em bi vî karî gelek kêfxweşin. Bi vî karî em alîkariya malbata xwe dikin. Ez dixwazim hemû jin werin vê sûkê danûstandina xwe bikin û her wiha cihê xwe di sûka Papûle de bigirin."

## Wê Kurd û hêzên demokrasiyê bi serkevin

Endama Komîteya Tenduristiyê ya KCK'ê Rûken Sêrt ji bo hilbijartinên 24'ê Hezîranê bang li demokratên li Tirkiyê û kedkarên tenduristiyê kir.

Sêrt bal kişand ser hilbijartinên 24'ê Hezîranê û got, "Pewîste em çend salên dawî ji bîr nekin. Em ê bi têkoşîn, hêz û îradeya xwe bi ser bikevin."

Sêrt ji bo bloka demokratîk bang li hemû gelên li Tirkiyê kir û li ser sekna ku divê li dijî faşîzmê bê nîşandan got, "Mirov dikare bêjê ku hêza dewleta Tirk qels bûye. Ne tenê Kurd, pewîste civaka Tirkiyê û hemû gelên Tirk ên li Tirkiyê, di vê demê de xwedî li welat, ax û çanda xwe derkevin. Divê mirovên demokrat baş zanibe, eger bersiveke baş di 24'ê Hezîranê de ji rejîma AKP-MHP'ê re neyê dayin,



wê civaka Tirkiyê ber bi tinebûnê ve biçe. Girîng e hemû civakên bindest û kêm netewe bi vîn û yekîtiya xwe bloka demokratîk ava bikin. Eger em dixwazin civakeke çê û xwedî tenduristiyeke baş biafirînin, divê em faşîzma heyî ji holê rakin."

Ruken Sêrt diyar kir ku her dengê ji AKP-MHP'ê re were dayin wê bi xwe re faşîzmê û qirkirinê li Tirkiyê dijwar bike û wiha dewam kir; "Pewîste her kes dengê xwe bide HDP. Divê wek endamên tendurîstiyê xwedî li hemû beşên civakê derbikevin. Divê dengekî bi tenê jî ji faşîzma AKP-MHP'ê re neyê dayin."

Endama komîteya tenduristiyê ya KCK'ê Rûken Sêrt banga xwe bi van gotinan bi dawî kir; "Kurd û hemû pêkhateyên li Tirkiyê azadî û demokrasiyê dixwazin bi vîn û têkoşîna xwe dikarin bi ser bikevin. Pewîste xwedî li sindoqan derkevin. Li ku dibin bila bibin yek dengê xwe nedin faşîzmê. Pewîste ew diziya ku li Kurdistanê tê kirin, ew neheqiya ku tê kirin; bi taybet jî ava Kurdistanê, axa Kurdistanê, dewlemendbûyina Kurdistanê tê firotin, pêwîste em jê re bêjin 'êdî bes e'. Yên bi ser bikevin wê hêzên demokrasiyê bin."

## Şervana enternasyonalîst hate bîranîn




Şervana enternasyonalîst Ûta Scheîderbanger ê di 31'ê Gulana 2005'an li Herêmê Parastinê yên Medyayê di encama qezayekê de şehîd bibû, li bajarê Mulheîmê li ser gora xwe hate bîranîn.

Di 13'emîn salvegera şehîdbûna Ekîn Ceren Dogrûak (Amara) û aktivîsta Tevgera Jina Azad a Kurdistanê Ûta Scheîderbanger li Mulheîm an der Ruhrê li ser gora Ûta merasîmeke bîranînê hate lidarxistin.

Şervana enternasyonalîst Ûta Scheîderbanger li ser gora xwe hate bîranîn. Li ser gora ku wêneyê şehîd Ekîn Ceren Dogrûak (Amara) û Scheîderbanger hate xemilandin, li ser navê Navenda Jinên Ûtamara, Enstutiya Kurd, Buroya Aştiyê ya Jinên Kurd (CENÎ) û nûnerên akademiya çandê axaftin hatin kirin.

Li gel Dayîka Ûta Scheîderbanger, bav û birayên wê nêzî 50 kes tevlî bîranînê bûn..



## Hêviyên Pêşerojê

Binevş SARYA

Ji boyi jiyan bidome û hebuna zindî û nebatan bi dawî nebe hemu candar pêwîstiya xwe bi zêdebunê dibînin. Ji nava candaran de, yek ji wanjî hebuna mirovane ku ya herî zêde pêwîstiya xwe bi zêdebun û mayînde kirinê dibîne. Lê belê zêde kirina mirovan tenê têra jiyankirinê nake. Ji boyi ku mirov bi awayek baş bikaribe bijî û bide jiyan kirin. Pêwîstiya mirovan bi zanînê heye, bê guman her mirovek an ji her candarek xwedî zanebunek baş ya jiyankirinê ye. Lê gelo her kes dikare bi awayek rasti û baş bijî? Ji boyî bersiva vê pirsê girînge ku mirov hinekî li ser xwe û civaka xwe bihizire. Civaka meda zêdebuna nîcel gelek di asta jordaye. Lê ya rasti di asta nîtelîkde em gelek lewazin. Her civak ji boyi baştir û xweştir bikaribe jiyana xwe bidomîne pêwîstiya wê bi zanebunek herî baş heye. Di cavakên meda asta perwerde kirina zarokan daketîye pileya heri jêrîrîn.

Ji boyî pêşerojek me ya baş hebe pêwîstiya me bi zarokên zane hen. Lê gelo em çiqas zarokên xwe ku hêviya pêşerojên mene, em wan perwrde dikin û bi awayek rasti didin xwendin? Rojê çendi kes bi xwendina zarokên xweve an ji zarokanve mijul dibin. Zêdebun ne tenê bedeniye, zêdebuna herî rast a fikiriye. Di civakên meda heskirina li beran berî xwendinê gelek lewaze, em hemu baş dizanin ku sedema wê ji zaroktîva tê. Ger zarok hîn di temenên 6,7 salîde desti bi xwendina pirtukan bikin, an ji dayik bav û mezinên malê wana fêr û mecbûrî xwendinê bikin. Wê demê wê pileya xwendinê di welatê meda derkeve asta heri jorîn.

Ji boyî em rasti bijîn pêwîstiya me hemûyan bi zanebunê heye. Ya herî rasti jî ewe ku em zarokên xwe baş perwerde bikin. Terbiya malbatê perwerda bingehîn a jiyanê ye. Ger îro di civaka meda kêm û kurtasî zêdebin sedema yekem ji xelet perwerde kirina zarokane. Dema ku zarok hîn di rehima dayka xwedene desti bi perwerda yekem tê kirin. Ew dayîk di dema ducaniyê de bi çira û derûniya wê çawanbe wê ew zarok jî wisan were ser ruyê Cîhanê. Nimûne dema dayîk ducanî pêwîste gelek bixwine. Xwe di heri milîda perwerde bike, gelek bi coş û xoroşbe. Ji bere deruniya dayîkê çawanbe di dema ducaniyê de ya zarok jî wisan dibe. Mamusteya yekem a jiyanê dayîke. Ji boyî civakek zane were xwiliqandin beriya her tiştî pêwîste ku dayikên me bi her awayî xwe perwerde bikin ku bikaribin hîn baştir pêşeroja me bixwiliqînin. Di hindirê malê de lazime tu caran zarok bi lêdan û tirsê neyên perwerde kirin. Ji ber ku lêdan û tirs zarokan fêrî derewan dike. Di heman demê da lêdan an ji tirs deruniya zarokan xirabi dike, dema ku zarok hatin tirsan din xwe mecbur hîsdikin ku nerasti biaxivin ji boyî lêdanê nexwin. Ji ber lêdanê zarok dibin kesên derewker. Ji xwe dema ku di zaroktîda fêrî derewan bun, piştî ku mezin bibin ji wê ew taybetimediya xirabi bi wanra dewam bike. Mirovên ku derewan bikin dikarin hemû şêweyên xerabiyan jî bikin. Ji ber wê lazime ku em zarokan netirsînin.

Heman demê de lêdan dibe sedem ku zarok tirsonek û bê cesaretî jî bibin. Cesareta wana a li beranberî zanebuna wan kêmdibe. Ji xwe bê hêvî dibin.

# Her tişt wê li gor dilê AKP'ê nemeşe

***Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Mûrat Karayilan, Pêngava 1'ê Hezîranê û hilbijartinên 24'ê Hezîranê yên li Tirkiyê nirxand. Karayilan got, "Dewleta Tirk biryar daye ku HDP'ê di bin benda hilbijartinê de bihêle lê wê ev yek bi hêsanî pêk neyê."***

Karayilan diyar kir dewletê biryar daye ku HDP'ê li binê bendê bihêle, lê her tişt bi dilê dewletê nameşe. Ev yek bi karê gelê Kurd û hêzên demokrasiyê ve girêdayî ye. Serketina HDP'ê wê rê li ber pêvajoyeke nû ya demokratîk veke.
Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Mûrat Karayilan, sedem û encamên pêngava 1'ê Hezîranê û hilbijartinên 24'ê Hezîranê yên li Tirkiye û Bakurê Kurdistanê nirxand.
Karayilan bi bîr xist ku tevgera azadiyê ya Kurdistanê bi pêşniyar û fermana Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan roja 2'ê Tebaxa 1999'an şer sekinand û got, "Heta Hezîrana 2004'an yanî 5 salan ji bo avakirina bingeheke çareseriya siyasî, ji bo dewleta Tirk dest bi diyaloga çareseriya demokratîk û aştiyane ya pirsgirêka Kurd bike, me fîşekek jî neteqand. Lê belê dewleta Tirk gav neavêt."



### BI XWESTIN TEVGERA ME TASFIYE BIKIN

Karayilan destnîşan kir ku bendewariya dewleta Tirk tasfiyekirina Tevgera Azadiyê ya Kurd bû û wiha dewam kir: "Armanca dîlgirtina Rêberê me bi rêya kompolya navneteweyî ev bû. Bi hilbijartina 2002'an re AKP bû desthilatdar. Wan jî siyaseta înkar û tinekirinê bi heman rê û rêbazî dewam kirin. Bi rengekî hê veşartî û durû ev siyaset dewam kirin."
Li ser vê siyaseta qirêj a desthilatdariya AKP'ê, Karayilan got "Sermeselê gotin, 'Kurd birayên me ne'. Lê belê tiştek nekirin. Ji bo Tevgera Azadiyê ya Kurd tasfiye bikin serî li her rê û rêbazê dan. Siyaseta înkar, tinekirin û asîmîlasyonê dewam kirin. Herî dawî hin kesên li nava tevgera me bi kar anîn û xwestin bi destê wan tasfiye bikin. Bi vî rengî xwestin encamekê bi dest bixin."
Karayilan destnîşan kir, piştî ku ev plana dewleta Tirk a dagirker ji her alî ve kifş bû, di civîna 2. a Kongra Gel de biryara Pêngava 1'ê Hezîranê hate dayin û ev biryar ji hingî ve bi cih tê anîn.

### ŞERÊ EM DIKIN ŞERÊ XWEPARASTINÊ YE

Mûrat Karayilan da xuyakirin ku ji ber polîtîkayên qirêj ên dewleta Tirk, ew neçar man xwe biparêzin û got, "Şerê ku em dikin şerê xweparastinê ye. Dewleta Tirk ji bo tasfiyekirina me, gelê me tevdigeriya. Bêguman em xwe bi rengê îdeolojîk, çandî û siyasî ve diparêzin. Lê belê li cihê ku ev bê bandor hatine xistin, em neçar in xwe bi rengekî çekdarî biparêzin. Eger çek nebûya, dibe ku weke gel û tevger em niha qediyabûna. Lewma mafê me yê herî xwezayî ye ku li dijî van êrîşên berfireh xwe bi rengekî çalak biparêzin.

### BIRYAR DANE HDP'Ê DI BINÊ BENDÊ DE BIHÊLIN

Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Karayilan diyar kir, Erdogan û dewleta Tirk paşeroja xwe bi tasfiyekirina gelê Kurd ve girêdane û wiha pê de çû: "Dibêjin, 'Eger Kurd bi ser bikevin, em ê têk biçin'. AKP'ê û dewleta Tirk biryar dane ku HDP'ê di binê bendê de bihêlin. Dixwazim vê destnîşan bikim; ev yek biryarek e. Tevî ku ji derve, ji Neteweyên Yekbûyî û gelek hêzên din rexne hatin kirin û hate destnîşankirin ku hilbijartin nabe ku di nava Rewşa Awarte de bê kirin, wan biryara hilbijartinê dan. Destpêkê dixwazin Kurdan li Tirkiyê biqedînin, piştre jî li Iraq, Îran û Sûriyê Kurdan biqedînin. Dibe ku hin Kurd niha baş fêhm nakin, ya jî xwe li nefêhmkirinê datînin. AKP û MHP'ê stratejiya xwe li ser vê bingehî ava kirine."

### HER TIŞT LI GORÎ DILÊ WAN NAMEŞE


Karayilan destnîşan kir ku her tişt li gorî dilê wan nameşe û got, "Niha di nava xwe de tifaq kirin. Bi MHP'ê re Tifaqa Cûmhûr kirin. Yên ku ji MHP'ê qut bûn û partiyeke din ava kirin, tevî hin partiyên din Tifaqa Millet ava kirin. Her du tifaq jî rastgir in. HDP bi tena serê xwe eniya demokrasiyê temsîl dike. Paşeroja komên ku li derveyî sîstemê hatine hiştin, di nava HDP'ê de ye. Di halê hazir de HDP ji bo demokrasiyê weke alternatîfekê têdikoşe. Mejiyê tifaqên din tekparêz an jî şoven e. Li ser maf û azadiyan polîtîkayeke xwe nîne. Li dijî hemû êrîş û fenên van hêzan, HDP dikare ji texmînan jî bêhtir deng bigire. Divê hemû xebatkarên HDP'ê, gelê Kurd, tevgera sosyalîst a Tirkiyê, Ermenî, Suryanî, Elewî, hêzên li derveyî sîstemê zanibin ku ev kar wê ne hêsan be. Divê zanibin ku biryara fermî ya dewleta Tirk ew e ku HDP'ê li binê bendê bihêle. Bi vê têgihiştin û zanebûnê divê her kes bixebite. Divê karekî welê bê kirin ku sed-du sed hezar dengan bidizin jî ev yek divê bandorê neke."

### DIVÊ HERKES LI BER POLÎTÎKAYA QIRÊJ RABE

Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Mûrat Karayilan diyar kir ku rejîma AKP'ê û hêzên dewletê ji bo serneketina HDP'ê hemû derfetên xwe bi kar tînin û got, "Guhertina cihê sindoqan, danîna sindoqan li qereqolan, yekkirina sindoqan li gorî dilê xwe... Pêwîste gelê me bi vê zanibe û xwe sist neke. Her kesên ku dixwazin ev sîstema tekparêz û dîktator bê guhertin, girîng e di vê çarçoveyê de tevbigerin. Pêwîste kes li berjewendiyên xwe yên şexsî nefikire û li dijî polîtîkayên qirêj ên dewleta Tirk yekîtiyê esas bigire. Divê ne pirsgirêk be bê kî bûye namzet kî nebûye. Serketina di hilbiljartinê de wê deriyê bihuştê veneke, lê belê wê li Tirkiyê pêşî li destpêkirina pêvajoyeke nû ya demokratîk veke."…*ANF*

## Rizgarkirina Minbicê gelek hevsengî guhert

Endamê Fermandariya Meclîsa Leşkerî ya Minbicê Mihemed Ebû Adil diyar kir ku armanc ji rizgarkirina bajarê Minbicê xilasiya welatiyan ji zulm û tarîtiya çeteyên DAIŞ'ê bû û got, "serkeftina Minbicê gelek hevsengiyên leşkerî û siyasî de guhert."
Beriya du salan di 1'ê Hezîrana 2016'an de Meclîsa Leşkerî ya Minbicê ku di bin sîwana Hêzên Sûriya Demokratîk de tevdigere hemleya rizgarkirina bajarê Minbicê û gundewarê wê ji destên DAIŞ'ê da destpêkirin.
Bi boneya duyemîn salvegera destpêkirina hemleya rizgarkirina Minbicê ku piştre bi navê Hemleya Şehîd Feysel Ebû Leyla hate naskirin, Endamê Fermandariya Meclîsa Leşkerî ya Minbicê Mihemed Ebû Adil axivî.
Ebû Adil got, "Di Adara 2016'an de beriya ku hemleya rizgarkirina Minbicê dest pê bike, welatiyên bajarê Minbicê damezrandina Meclîsa Leşkerî ya Minbicê gotûbêj kirin da ku karibin bajarê xwe ji tarîtiya çeteyên DAIŞ'ê rizgar bikin. Piştî ku Meclîsa Leşkerî hate damezrandin tavilê dest bi amadekariyên hemleya rizgarkirinê hate kirin. Meclîsa Leşkerî bi hevkariya Hêzên Sûriya Demokratîk û Koalîsyona Navnetewî re leşkerên xwe birêxistin kirin û gelek tedbîrên leşkerî wergirtin."
Ebû Adil diyar kir ku armanc ji hemleya rizgarkirinê xilaskirina welatiyan ji zulm û tarîtiya çeteyên DAIŞ'ê bû û wiha dewam kirk, "Di vê hemleyê de pişta wan hate şikandin û welatiyên Mibicê yên ku hatine koçberkirin vegeriyan malên xwe, her wiha siyaseta Tirkiyê ku alîkariya çeteyên DAIŞ'ê dikir li herêmê têk çû."
Ebû Adil di berdewama axaftina xwe de da zanîn ku hemleya rizgarkirina Minbicê li ser daxwaz û bangên dubare yên welatiyên Minbicê bû da ku ji hovîtiya çeteyên DAIŞ'ê rizgar bibin.
Ebû Adil diyar kir ku Minbic ji ber cihê wê yê stratejîk pira di navbera Tirkiye û Sûriyê de bû û wiha dewam kir: "Şerê rizgarkirina bajarê Minbicê li Sûriyê yek ji şerên girîng yên li i dijî terorê bû. Meclîsa Minbicê ya Leşkerî û tabûrên din bi rizgarkirina Minbicê riya alîkariya Tirkiyê bi komên terorîst ên di hundirê Sûriyê de birrîn, bi taybet riya alîkariya bi çeteyên DAIŞ'ê re yên li herdu bajarên Reqa û Dêrazorê."




Ebû Adil destnîşan kir ku bi destpêkirina hemleya rizgarkirina Minbicê re pişta DAIŞ'ê hate şikandin û got: "rizgarkirina bajarê Minbicê gelek dewletên herêmî û di serî de dewleta Tirk ku alîkariya DAIŞ'ê dikirin bi hêrs kirin. Bi rizgarkirina bajarê Minbicê re ewlehî û aramî li bajêr de pêk hat."
Endamê Fermandariya Meclîsa Leşkerî ya Minbicê Mihemed Ebû Adil di dawiya xaftina xwe de bang li welatiyên Minbicê kir ku hevgirtina xwe bi Meclîsa Leşkerî ya Minbicê re berdewam bikin û hemû saziyên xwe bi çalak bikin û ji bo têkşikandina hemû komployên li dijî herêmê û welatiyan bi yek destî tevbigerin…**ANHA**

## Divê Kurd jî di navde hevdîtinên aştiyê dest pê bikin

Parlamenta Federal a Swîsreyê bûyerên li Sûriyê diqewimin weke sûcê şer bi nav kir û şermezar kir. Platformê bang li Neteweyên Yekbûyî kir ku bi tevlîbûna Kurdan dest bi hevdîtinên nû yên aştiyê bike.
Şerê navxweyî yê li Sûriyê roj bi roj derbasî qonaxeke nû dibe. Parlamenta Federal a Swîsreyê biryarên girîng stand û bang li Neteweyên Yekbûyî (NY) kir ku li Sûriyê agirbestê ragihîne û Kurd jî di nav de dest bi pêvajoyeke nû ya aştiyê bike.
Komîsyona Têkiliyên Derve ya Swîsreyê pêşnûmeyek li ser Sûriyê beriya niha bi çend mehan pêşkêşî Parlamenta Federal a Swîsreyê kiribû. Pêşnûme roja 31'ê Gulanê li meclîsê hate nirxandin û qebûlkirin. Piraniya parlamenteran pêşnûme qebûl kirin. Di pêşnûmeyê de gelek biryarên girîng hene.
Di pêşnûmeyê de ku bi sernavê "Dawî li sûcên şer ên li Sûriyê bînin" hate qebûlkirin, bang û biryara Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî hate bibîrxistin ku 24'ê Sibatê banga agirbestê li aliyên li Sûriyê şer dikin hatibû kirin.
Di pêşnûmeyê de hate ragihandin ku Swîsre, binpêkirina mafên mirovan û binpêkirina hiqûqa navneteweyî li Sûriyê bi tundî şermezar dike.
Parlamentê ji hemû aliyên ku li Sûriyê şer dikin xwest ku bi rêzdarî nêzî hiqûqa navneteweyî bibin û diyar kir, li Sûriyê sûcê şer tê kirin û dewlet û kesayet ji vî sûcî berpirsyar in.
Bang li hemû aliyan hate kirin ku destwerdanên xwe yên leşkerî yên li Sûriyê tavilê biqedînin û hate gotin, "Divê hemû alî li gorî hiqûqa navneteweyî tevbigerin û hêzên xwe yên leşkerî ji nava axa Sûriyê vekişînin."
Parlamenta Federal ji Konseya Federal a Swîsreyê xwest ku li dijî bûyerên li Sûriyê diqewimin hêza xwe bi kar bîne û Neteweyên Yekbûyî bixe nava liv û tevgerê. Her wiha bang li Neteweyên Yekbûyî jî kir ku agirbesteke nû li Sûriyê ragihîne û li gel beşdariya Kurdan pêvajoyeke nû ya hevdîtinên aştiyê dest pê bike.

## DYA'yê derbarê QSD'ê de Esed hişyar kir



Wezareta Parastinê ya Amerîkayê (Pentagon) hişyarî da serokê rejîma Sûriyê Beşar Esad ku êrîşê nebe ser Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê.
Ji Serokatiya Fermandariya Giştî ya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê general Kenneth McKenzie hişyarî da rejîma Sûriyê ku êrîşeke li dijî Amerîka ya jî hêzên hevalbendên wan, wê bibe 'polîtîkayeke gelekî nebaş'.
McKenzie di civîna çapemeniyê de li ser daxuyaniyên Beşar Esad ên di kanala Russia Today de hatin weşandin, axivî. Esad gotibû, "Yekane pirsgirêka ku maye Hêzên Sûriya Demokratîk e." Esad gef xwaribû ku dikare li dijî QSD'ê hêzê bi kar bîne.
Kenneth McKenzie hişyarî da û got, "Divê hemû aliyên li Sûriyê fêhm bikin ku êrîşa li dijî hêzên Dewletên Yekbûyî yên Amerîka ya jî partnerên me yên li Koalîsyona Navneteweyî wê bibe polîtîkayeke gelekî nebaş."

### ESAD GEF XWARIBÛ

Esad ji Russia Today re axivî bû û li ser hebûna hêzên QSD'ê gotibû, "Ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê du alternatîfên me hene. Me beriya her tiştî rêya danûstandinan vekir, ji ber ku piraniya endamên QSD'ê ji Sûriyeyiyan pêk tê. Eger ji vê rêbazê encamek bi dest nekeve, em ê 'axa xwe' bi bikaranîna hêzê rizgar bikin. Wekî din alternatîfeke me nîne."



# Bila hêzên Tirk ji Başûr werin derxistin

***Parlementerê YNK'ê Geşe Dara û parlementerê Goran Omer Înayet diyar kirin ku dewleta Tirk hewl dide başûr Kurdistanê dagir bike û dan zanîn ku divê hêzên Tirk ji başûr werin derxistin. Parlementeran got, "Armanca Tirkiyê ne şerê li dijî PKK'ê ye. Armanca wan dagirkirina başûrê Kurdistanê ye."***

Parlamenterên YNK û Tevgera Goran dagirkeriya dewleta Tirk weke binpêkirina serweriya Iraqê û hewldana dagirkirina Başûrê Kurdistanê bi nav kirin. Parlamenteran ji parlementoya Iraqê daxwazkirin ku ji bo vê mijarê kom bibin û ger Tirkiye dernekeve Iraq û herêm peywendiyên xwe qut bikin.
Dagirkeriya dewleta Tirk ya li ser xaka Başûrê Kurdistanê berdewam dike. Dewleta Tirk sînorên Herêma Kurdistan û Iraq derbaz dike û dagir dike.
Parlamentera YNK'ê Geşe Dara bêdengiya hikûmeta navendî ya Iraqê ya di mijara dagirkeriya Tirk de rexne kir û destnîşan kir ku nabe hikûmeta Iraqê binpêkirinên sînorên Iraqê bi pejirîne û wiha axivî; "Ji bo çi Iraq ji xwe napirse, kengê bixwaze serweriya Iraqê binpê dike. Iraq di ber vê yekê de berpirsyare ku Tirkiye îro leşker û hêz derbasê Kurdistanê dike. Ji ber Başûr beşek ji xaka Iraqê ye."

### HAYA PDK'Ê JÊ HEYE

Parlamentera YNK'ê diyar kir ku artêşa Tirk li herêmên dibin kontrola PDK'ê de bi cih bûne û da zanîn ku ev tê wê wateyê ku agahiya PDK'ê ji vê heye û got, "Hêvîdarim ku ev negihije wê astê ku xiyanetê li çar parçeyên Kurdistanê bike."

### NAKOKÎ FERSENDÊ DIDE TIRKIYÊ

Parlamenterê Tevgera Goran Omer Înayet jî li ser heman mijarê axivî û balkişand ser nakokiyên di navbera Herêma Kurdistan û Bexdayê de û got; "Valahiya di navbera Bexda û Herêma Kurdistanê de, wer kiriye ku Tirkiye ji bo xwe bike firsend û di aliyê siyasî, serbazî û aboriya xwe de bi karbîne."

### DIVÊ PÊWENDIYAN RAWESTÎNIN





Înayet ji bo ev pirsgirêk bi awayeke lezgîn were çareserkirin daxwaz kir ku parlementoya Herêma Kurdistanê ji bo hêzên Tirk ji Başûr derxin bicive û wiha pêde çû: "Ji bo hêzên Tirk ji herêmê were derxistin divê parlemento bicive. Eger ev pêk ne hat wê demê divê Iraq peywendiyên xwe yên li gel Tirkiyê rawestîne. Bi heman awayî divê Herêma Kurdistan jî peywendiyên xwe yên li gel Tirkiyê rawestîne."
Omer Înayet diyar kir ku armanca sereke ya Tirkiyê dagirkirina Herêma Kurdistanêye û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Tirkiye dibêje şer li dijî PKK'ê ye. Lê ev yek ji rastiyê dûr e. Niyeta wan dagirkirina Herêma Kurdistanê ye. Berjewendiyên kesî û hizbî di navbera Erdogan û PDK'ê de heye. Ev berjewendî, ji destdirêjiya li ser Kurdistanê tê kirin girîngtirin."…*ROJNEWS*

## Îrana demokratîk, Kurdistana Azad



Hevserokê KODAR'ê Fûad Bêrîtan diyar kir ku meyla civaka Îranê li ser demokratîkbûnê heye û got, `pêwîstî bi polîtîkayeke nû heye.`
Hevserokê Civaka Demokratîk û Azad a Rojhilatê Kurdistanê KODAR'ê Fûad Bêrîtan diyar kir ku li Îranê kevneşopiyeke xurt ya civakî û çandî heye û got, "Nirxên edalet û wekheviyê di bingeha nirxên çandî yên civakî de bi xurtî hene. Çandeke demokratîk û azadîparêz jî heye. Dîroka kevn li aliyekî, di şoreşa Îslamê ya Îranê ya şoreşa ku Şah têk bir de, taybetmendiyên xurt ên demokratîk hene. Di nava civakê de hişyariyeke xurt a demokratîk derkete holê. Li Îranê şoreşa demokratîk pêk hat. Vê şoreşê hest û karakterê civaka Îranê bi berfirehî guherand. Civak bi rengekî koledarî serî li ber dewlet û desthilatadriyê natewîne. Meyla xwe li rêxistinbûn û tevgereke demokratîk heye."
Bêrîtan bal kişand ser zextên rejîma Îranê ya li dijî Kurdan û got, "Bi gotina, 'rejîm zextê li gel dike' nabe ku em rastiya li nava civaka Îranê ji nedîtî ve werin. Yên ku ji bo demokrasiyê têdikoşin, dixwazin Îranê demokratîk bikin û pirsgirêka Kurd li ser bingeha siyasî demokratîk çareser bikin û Îraneke demokratîk biafirînin, şert e ku bi rengekî objektîf û rasteqîn li rewşa Îranê binerin. Mirov dikarin vê bi dilrehetî bêjin: "Di nava welatên Rojhilata Navîn de, piştî Kurdistanê, piştî rastiya civaka Kurd, civaka ku herî zêde meyla xwe li ser nirxên demokratîk û demokratîkbûnê heye, civaka Îranê ye."
Fûad Bêrîtan destnîşan kir ku weke KODAR'ê ew çareseriya siyasî ya meseleya Kurd bi şêweyê demokratîkbûna Îranê dinirxînin û wiha dewam kir: "Lê belê çareseriya herî baş a ji bo vê gavê li Îranê were kirin ew e, ku hêzên civakî bên aktîfkirin, li Îranê bi reforman pêşî li demokratîkbûnê were vekirin û di serî de meseleya Kurd pirsgirêka hemû gelên din ên li Îranê li ser bingeha siyasî demokratîk bê çareserkirin. Bêguman pêvajoya demokratîkbûna Îranê wê ji bo azadiya gelê Kurd jî derfetên girîng pêşkêş bike."
Bêrîtan diyar kir, ew dixwazin di nava jiyana çandî, siyasî û civakî ya Îranê de dawî li paşverûtiyên ku dînamîzma civakî ji holê radikin bînin û got, "Ev yek jî wê ne bi mejiyê cîhana rojava bê kirin. Ev yek wê li ser bingeha nirxên erênî yên Îranê, li ser bingeha rastiya dîrokî ya Rojhilata Navîn bê kirin."
Hevserokê KODAR'ê destnîşan ku demokratîkbûna li Îranê û têkoşîna azadiyê wê di nava şert û mercên Îranê de rû bide û diyar kir, mûxalefeta li Îranê jî divê vê yekê bibîne û bi gotineke nû, bi polîtîkayeke nû, bi zimanekî nû têkoşîna demokratîk bi pêş ve bibe.
Bêrîtan da xuyakirin ku hebûna gerîla wê weke garantiya azadî û demokrasiyê bidome û got, "Wê hêzeke parastinê be. Li dijî her şêwe êrîşan wê gel û nirxên gel biparêze. Têkoşîneke bêyî parastina rewa, bi taybetî li cihekî mîna Rojhilata Navîn tê wê wateyê ku mirov berxê radestî gur bikin."
Fûad Bêrîtan diyar kir ku tevî hebûna hêzên parastina rewa, girîng e rêxistinbûna demokratîk were xurtkirin, li ser bingeha têkoşîna demokrasiyê ya bi gelên Îranê re ji bo armanca Îrana demokratîk û Kurdistaneke xweser a demokratîk an jî federal, têkoşîn bê xurtkirin.

## 25'ê Hezîranê de emê jiyaneke nû ava bikin

Hevserokê HDP'ê Sezaî Temellî diyar kir ku 24'ê Hezîranê têkçûna AKP-MHP'ê wê aştiyê hêsan bike û bang kir ku her kes li HDP'ê û sindoqan xwedî derkeve.
Hevserokê Giştî yê Partiya Demokratîk a Gelan HDP'ê Sezaî Temellî çû Amedê. Temellî serdana parlamenterên HDP'ê, namzetan kir û çû Meclîsa Dayikên Aştiyê ya li Baxlarê. Temellî li wir li ser hilbijartinê û têkoşîna aştiyê axivî.

### BÊ DEMOKRASIYÊ AŞTÎ NABE

Temellî diyar kir wan xebatên xwe li ser têkoşîna aştî û demokrasiye dane rûniştin û got, "Me got heta ku demokrasî neyê vî welatî aştî nabe. Ji bo me pir girîng e ku me serdana Dayikên Aştiyê kir, ku xwe xistine bin barê aştiyê û dengê aştiyê gur dikin."



### EM DESTHILATIYA ŞER RAWESTÎNIN

Temellî da zanîn ku Dayikên Aştiyê bi salan e ji bo aşitî were têdikoşin, berdêlên ku dayikan dayin bi bîr xist, Dayika Taybet mînak da û got, "Li vir em dixwazin destpêkekê bikin, em dixwazin bi Dayikên Aştiyê re vê bangê bikin. Encex em dikarin dawî li polîtîka û hişmendiya şer bînin. Em dikarin rê li ber bigirin ku careke din ev nebin. Werin em li vir ji vê desthilatdariyê re, ku bi polîtîkayên şer dimeşe, bibêjin, êdî bes e. Dayikên Aştiyê tim li pêş bûn di vê têkoşînê de, ji bo ku ev şer û zilm raweste tim dengê xwe rakirin." Temellî wiha domand, "Ji 24'ê Hezîranê re hindik ma, em ê biçin ser sendoqê û li aştî, li vîna xwe xwedî derkevin. 25'ê Hezîranê ji bo ku ev êş dîsa neyên jiyîn, em ê jiyanê bi hev re ava bikin."

### GELÊ ME WÊ LI SINDOQAN XWEDÎ DERKEVE

Temellî li ser pirsa nûçegihanan a têkildarî biryara YSK'ê ya li ser veguhaztina sindoqan got, "Dixwazin HDP'ê di bin bendê de bihêlin. Hemû gelê me, hilbijêr wê biçin ser sendoqê û li deng û vîna xwe xwedî derkeve. Çi jî bikin em ê li ser sendoqên xwe bin."

### EWLEHIYA SINDOQÊ LI SER HDP MAYE

Temellî got ewlehiya sindoqan dewlet distîne lê niha ewlehiya sendoqan li ser HDP'ê û partiyên din maye û wiha dewam kir, "Astenga mezin a li pêş dayina dengan a bi rengekî ewle, dewlet e. 250 hezar hevalên me wê bixebitin. Platforma Hilbiljartinê ya Dadmend avabûna xwe ragihand û em di nav vê de ne. Li her derê her kes wê li sindoqê û dengê xwe xwedî derbikeve."

## Çare



### Xizanî

Sîpan CAN

Xizanî an jî perîşanî, dema ev gotin tê guhê mirov yekser tunebûna pere, nan, milik û mewal û luksên jiyanî tê bîra mero. Ango xizanî tenê bi tiştên madî tên dîtin. Li gorî her civakekê wateya xizanî û perîşanî ji hev û din cud cuda ne. Hinek di milên xwe yên madî de dibînin û hin jî di milê manewî, ramiyarî û zanistî de dibînin.
Dibe ku, di sedsala 21'emîn de, teknoljî gihêştiye astek ne normal ku qaşo ji bo çareserkirina pirsgirêk û pêdiviyên însanan hatine çêkirin, em li welatên herî dewlemend bibînin parsek û kesên li kolanan radizên hebin. Li gorî serjimariyên heyî li bajaerekî wek New York'ê tenê 4 milyon Penaberên ku bê mal in û li kolana li ser kartonnên riziyayî jiyana xwe derbas dikin hene. Her wiha Li Ewropayê car caran mirov dibîse ku hin kes ji serma re mirine û li wan kolalnan avêtî maye û kesî wî binaxbike jî nîne. Di dawiyê de, laşê wî dibe saheyekî tecrubeyên bijîşkan.
Gelek nivîskae, fîlozof û hekîmên cîhanê jî, li ser mijara xizaniyê axifîne. Aliyê ruhî û zaniyarî ya vê mijarê nirxandine. Hem kes û hem jî civak nirxandine. Ka bê xizanî di wateya xwe ya kûr de çiye. Gelo em niha li ser civaka xwe vê mijarê behs bikin, em civakekî xizanin; an jî em di kîjan milî de xizan mane.
Em baş li dîroka xwe ya kurdan binêrin. Em ê tekez bibînin ku em ji aliyê nirxên civakî û exlaqî de xizanin. Civaka kurd ku ji hezarên salan di şaristaniya Medyayî a Mezoptamyayê mezin bûye, bi nirxên xwe gelek dewlemende, mêvanperwere, wêreke, ji her milê jiyanî ve jîre, diladare.... hwd. di milê çanda xwe de jî, bi qasî destan û çîrokên lehengî û evînî têr û tejî ye. jiber van tiştan em dibînin di bingeh de, kurd bi xwezaya xwe û çanda xwe dewlemend bû. Vêca niha em xizanên çine? Helbet, wek gelek kesan diyarkir xizanî ne xizaniya madî û pereyan e. her çiqas welatên cîhanê yên pêşketî-qaşo- ji her milî de têr û tije ne; lê ji nirxên xwe ango ji nirxên mirovahiyê dûrketine. Civka me ya kurd jî heya niha hin ji wan nirxên xwe parstine, lê; di kîjan milî em xizan mane. Di milê xwedîderketina li van nirxan û partîkirina wan di jiyana me ya rojane de. Yek ji nirxana jî, komînalbûn, bi kes an jî malabta li rex xwe nêrandin û li hev guhadrî kirine. Nexwe em bi êş û azarên kesên hawîrdora xwe nehesin, ev xizaniya herî mezin e.